# MIZGÎN

Hejmara - 206 ( 15 - Gulan - 2026 ) **Bê dirave**



# Naverok


**Weşan**
Sûzan Elî

**Amadekirina Naverokê**
Amir Ferso

**Dîzayn**
Mecid Alsadûn

**Şêwekar**
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Rojhilat

**Sererastkirina Kurdî**
Mihemed Xanim

**Sererastkirina Erebî**
Abdulah Rehîl

Kovara Mazgîn


Kovara Mazgîn مجلة مزكين




1 Wênesazî
2 Wêjeya Zarokan
3 Lîsk
4 Welatê me
5 Tu dizanî
6 Tendirustî
7 Tîp û gotin
8 Navdar
9 Bexçeyê Navan
10 Jîngeh mala me ye
11 Jêhatiyên Zarokan
12 çîrok
16 Bixwînin û fêr bibin
17 Çavika Mizgîn

Kulîlka nêrgizê wekî di wêneya pêşiya we de rengîn bikin

لوِّنْ زهرةَ النَّرجسِ كما في الرَّسمِ المُرفقِ.







# Tirên


Tik tik tik wa tirênê
Tik tik tik wa tirênê
Vagonên te pir hene
Ji neha bêtire
Hin vagonên razanê
Hin vagonên xwarinê
Lingê te hesine
Li ser hesin diger e
Li gund û bajaran

Mirov tê de rehete
Tu pir bi lez û bez e
Li ser erdê tu dimeş e
Firok ji te cûda ye
Ew difir e tu dimeş e
Tik tik tik wa tirênê
Tik tik tik wa tirênê

**Hesîna Ehmed**

**Ji bo temamkirina xêzê, rêza hejmaran bişopînin.**

**اتبعْ تسلسلَ الأرقامِ لتُكمَلَ الرَّسْمِ**



# Merîwan

# مريوان



Bajarê Merîwan li Rojhilatê Kurdistanê, di nava qontara çiyayên bilind ên Zagrosê de ye.

Ew bi daristanên berû yên qelew ên tijî kulîlkên kovî hatiye dorpêçkirin. Herwiha tê de gelek ajal jiyan dikin, mînak: Rovî sor, pisîk û kergoşkê kovî, baz û qazên kovî. Û ji ber nêzîkî Gola Zerbarê ye ku gelek cureyên cûda yên masiyan lê dijîn. Qamîşên bilind li dora wê şîn dibin. Ji ber vê yekê, zarokên Merîwanê hez dikin ku bi malbatên xwe re biçin golê. Ew ji

تقعُ مدينةُ مريوانَ في روجهلات كردستانَ، وسطَ جبالِ سلسلةِ زاغروسَ العاليةَ. وتُحيطُ بها غاباتُ البلُّوطِ الكثيفةِ والمليئةِ بالأزهارِ البريَّةِ، وتعيشُ فيها حَيواناتٌ متعدِّدةٌ مثل: الثَّعلبُ الأحمرُ، والقِطُّ والأرنبُ البريُّ، والصُّقورُ والبطُّ البريُّ، وبالقرب منها توجدُ بحيرةُ زريبار، الَّتي تعيشُ فيها أنواعٌ مختلفةٌ من الأسماكِ. وحولَها نباتُ القصبِ الطَّويلِ. لذلك؛ الأطفالُ في مريوانَ يحبُّون الذَّهابَ مع عائلاتهم إلى البُحيرة. ويستمتعونَ بالموسيقا والرَّقصِ الكرديِّ، وكأنَّه مِهرجانٌ للعبِ والغناءِ.

# Girîngiya kedkaran di jiyana me de



Hevalên min: Hûn dizanin divê em her tim spasiya kedkaran û karkeran bikin; ji ber ku ew civakê ava dikin û xizmeta wê dikin, her wiha çi ji kê re pêwîst be pêşkêş dikin; bi vî awayî ew dibin avakerên jiyanê, em ji wan re hêvî dikin ku tişta ew dixwezin bi dest bixin.
Hevalên min, ka em kedkarekî ku di karê xwe de fedekar e xêz bikin, û li binê wê viya binivîsin:

**"Spas ji hemû kedkaran re!"**

# أهمية الكادحين في حياتنا

أصدقائي: هلْ تعلمُونَ، أنَّ علينا أن نشكرُ الكادحين دائماً؛ لأنهم يبنون المجتمع ويخدمونه، ويقدمونَ للنَّاس ما يحتاجونَ؛ وبالتالي هم يبنونَ الحياةَ، ونتمنَّى لهم الحصول على ما يستحقونَ.
أصدقائي، هيَّا نرسمْ كادحاً مخلصًا في مهنتهِ، ونكتبُ تحتَ الرَّسمِ:

**"شكرًا للكادحين كلِّهم!"**

# Sebze




Hevalên min ên biçûk, gelo we qet ji xwe pirsî ye çima her tim ji me re tê gotin ku em sebzeyan bixwin?
Ji ber ku di sebzeyan de ji bo laşê me gelek feydeyên mezin hene!
Gêzer... dostê çavan e.
Îspenax... masûlkeyan xurt dike.
Bacanê sor... parastinê peyda dike.
Xiyar... laş teze dike.
Ji ber wê hevalê min! Were em her roj sê cureyên cuda ji sebzeyan bixwin, da ku tu jî bibî dostê sebzeyan.



# الخُضارُ




أصدقائي الصِّغارَ, هلْ سألتُم أنفسَكم يومًا, لماذا يُطلبُ منا دائمًا أنْ نأكلَ الخُضارَ؟
لأنَّ الخُضارَ لها فوائدُ كبيرةٌ لأجسامِنا!
فالجزرُ... صديقُ العيونِ.
والسَّبانخُ... قوَّة للعَضلَاتِ.
والطَّماطمُ... درعٌ للحمايةِ.
والخِيارُ... انتعاشٌ للجسمِ.
لذلك صديقي! لنجربْ أنْ نأكلَ ثلاثةَ أنواعٍ مختلفةٍ من الخُضارِ كلَّ يومٍ, حتى تكونَ صديقَ الخضارِ.





**Hevalên hêja, tîpên kêm temam bikin; ji bo ku hûn navan li gorî wêneyên wan temam bikin.**





# Meryem Xan

# مريم خان

***Ew di sala 1904'an de li bajarê Şirnexê yê Bakurê Kurdistanê ji dayik bû. Di sala 1910'an de, ji ber şerên li wir diqewimin, ew û malbata xwe koçî bajarê Qamîşlo yê Rojava dikin. Piştî çend salan, Meryem Xan tevlî Dîwana Stranan bû ji ber ku dengê wê xweş û şîrîn bû. Piştre ew çû bajarê Zaxo li Başûrê Kurdistanê, û dû re jî diçe Mûsilê li Iraqê, li wir bi stranbêjên herî navdar ên wek Mihemed Arif Cezrawî, Hesen Cezrawî û Nesrîn Şirnexî re hevdîtin dike.***
***Di sala 1939'an de tevlî Radyoya Bexdayê dibe û gelek stranên wê tomar kirine ku gihêştiye 200 stranan. Ji girîngtirîn stranên wê Ay delal, Sêvê û Hecî alî, Lê lê wesê, Çemê bişêrîkê û Dotmam in.***
***Di sala 1949'an de, ew ji ber nexweşiya gurçikan mir û li Bexdayê, Iraqê, hate veşartin, û xezîneyek hêja ya muzîka Kurdî li pey xwe hişt.***

وُلدت سنة 1904 في مدينة شرناخ بباكور كردستان، وفي سنةِ 1910م، هجرت مع عائلتِها إلى مدينة قامشلو في روج آفا نتيجة للحروبِ الدَّائرةِ هناك، وبعدَ سنواتٍ انضمَّتْ مريم خان لديوان المغنيينَ، لأنَّ صوتَها جميلٌ وعذبٌ.
ثمَّ سافرتْ إلى مدينةِ زاخو بباشور كردستان، ومن ثمَّ إلى الموصل في العراق، وهناكَ التقتْ بأشهرِ المطربينَ، مثل محمَّد عارف جزراوي، وحسن جزراوي، ونسرين شرنخي.
وفي سنة 1939 انضمَّتْ إلى راديو بغدادَ، وسجَّلت الكثير من أغانيها، حتَّى بلغتْ أكثرَ من 200 أغنيةٍ ومن أهمِّ أغانيها Ay delal -Sêvê û Hecî alî -Lê lê wesê -Çemê biŞêrîkê -Dotmam
وفي سنة 1949م، توفِّيتْ بمرضِ الكِليةِ، ودُفنت في بغدادَ بالعراق، تاركةً كنزًا قيِّماً من الموسيقا الكُرديَّةِ.

# Hin Navên bi tîpa - J

Jala

Jarîn


Jiyan

Jînaz

Jîn

Jîngul

Jîrvîn



# Perperîkên biharê

# فراشاتُ الرَّبيعِ

Perperîk ne tenê xweşik in, ew di xwezayê de jî roleke girîng dilîzin.
Perperîk di navbera kulîlkên rengîn û bîhnxweş de digerin û şîrava wê dimijin, tozika kulîlkan bi lingên xwe digrin ya ku di bergirtina şînatiyan de xwedî role.
Navê vê b[yerê bergirtina şînatiyê ye, di encamê de kulîlk tûvik û berhemên nû dide. piştre şînatî xwe zêde dikin û mezin dibin.
Perperîk dibin sedema avakirina xwezayeke bi tendurist û tijî jiyan.

الفَراشاتُ ليستْ جميلةً فقط، بلْ لها دورٌ مهمٌّ في الطَّبيعةِ.
تنتقلُ الفَراشاتُ بينَ الزُّهورِ العَطرةِ الملوَّنةِ تمتصُّ الرَّحيقَ، ويلتصقُ بأرجلِها غبارُ الطَّلعِ، الَّذي لهُ دورٌ في تلقيحِ الزُّهورِ.
فتُسمّى هذهِ العمليَّةِ، التَّلقيحُ، لتنتجَ الأزهارُ بذوراً وثماراً جديدةً، ثمَّ تتكاثرُ النَّباتاتُ، وتنموُ.
فالفراشاتُ تساهمُ في وجودِ طّبيعةٍ صِحّيّةٍ، مليئةٍ بالحَياةِ.



# Ronaz Mistefa- 11 salî

## روناز مصطفى - ١١ سنة

- Ger tu ji bo rojekê bibî karakterekî kartonî, tuyê bibe kî?
- Lêpirsîner Konan, ji kesayeta Ran hez dikim, ji ber ku ew dilovan û wêrek e, û xwe û yên din diparêze.

– لو كنتَ شخصيةً كرتونيةً يوماً واحداً، من ستكون؟
– محقّقَ كونانَ، أحبُّ شخصيَّةَ رانْ، لأنَّها طيّبةٌ وشجاعةٌ، وتدافعُ عن نفسِها والآخرينَ.




# Îsa Zuhêr Salêh- 12 salî

## عيسى زهير صالح - ١٢ سنة


- Ger tu ji bo rojekê bibî karakterekî kartonî, tuyê bibe kî?
- Jerry ji Tom û Jerry, ji ber ku ew jîr û zû difikire.

– لو كنتَ شخصيةً كرتونية يوماً واحداً، مَنْ ستكون؟
– جيري من توم وجيري، لأنَّه ذكيٌّ، وسريعُ التَّفكيرِ.

# Çîroka :
# Hevala me Mêşhigiv




Em şîravan dixin hundirê şaneyan, piştre em tevdidin da ku bibe hingiv.
Waw… ev hemû ji kulîlkan derdikeve?
Xuyaye ku karekî xweş e û di heman demê de dijwar e
Ev jî şaha me ye, ew şaneyê bi rêve dibe.


Ew dibiriqe û xweşike, ez dikarim tam bikim?
Erê, lê hindik hh hh.
Tama wê gelekî xweş e.


Çi serpêhatiyeke balkêş e, hevala min mêşhingiv!


Mêşhingiv da ku hingiv çêke bi ked kar dike, divê em jî ji wê re rêzdariyê bikin.



Mûrî/Gêre
نَمْلةٌ
Ant



Mêş
ذُبَابَةٌ
Fly



Kulî
جَرادَةٌ
Grasshopper



Pilindir/Kevnepîr
عَنْكبُوتٌ
Spider

# Çavika Mizgîn عدسة مزكين



# مزكين


مجاناً

15- آيار - 2026

العدد - 206